Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar :1154  24-Adar- 2024  www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/  nameronahi@gmail.com  ☎ 423165

## Gulîstana şehîdan



Navenda Nûçeyan

**Gulîstana Şehîdan a li taxa cûdî bi xweşikbûn û paqijbûna xwe tê naskirin û ji bona gel cihê bêhnvedanê ye û ji bo zarokan jî cihê kêfxweşiyê ye.**

Gulîstan ji bo bêhnvedana welatiyan cihekî girînge, herwiha ji ber hebûna daran û şînatiyê di nava bexçeyan de, rola wê di pakkirina hawîrdor de sereke ye. Welatiyên bajarê Qamişlo jî, ji bo bêhnvedanê û dûrketina ji qerebalixa bajêr û ji bona wî jî berê xwe didin bexçeyan. Yek ji wan bexçeyên pak û paqij Gulîstana Şehîdan e. Gulistana şehîdan cihê bêhnvedana welatî û malbatan tê naskirin. Herwiha lîstokên zarokan jî di nava baxçede hene ew jî dibe cihê kêfxweşiya zarokan û bûrandina demekî xweş û şad. Gulîstana Şehîdan ya li taxa Cûdî di sala 2021`ê de kar û xebat ji bo avakirina wê hat kirin. Di sala 2022`an de bi fermî hat vekirin, ev bexçe girêdayî saziya malbatên Şehîdan e, di heman demê de baxçeyê yekemîne ku bi paqijiya xwe tê naskirin. ji bo milet jî cihê bêhinvedanê ye û ji bo zarokan jî cihê kêfxweşiyê ye. Di nava baxçeyê Şehîdan de lîstokên zarokan hene, armanc ji danîna lîstokan ew e ku demên xwe bi kêfxweşî derbas bikin. Li baxçeyê Şehîdan 750 dar di destpêka avakirina wê de hatibûn çandin, lê bi demê re hin ji wan hişk bûn. Herwiha ew darên hişk hatin rakirin, li şûna wan jî hin darên din hatin çandin. Ji ber baxçe bi daran bedew û geş dibe, avhewaya baxçeyan jî bi daran paqij dibe.

**‘Gulîstan ji bo bêhinvedana welatiyan cihekî girîng e’**

Ji bona meyzandina gulistanê jî endezyarê çandiniyê jî heye, her 2 mehan li rewşa daran dinêre. Ji bo pêwîstiya daran bi derman, semad, kolandin û paqijkirinê hebe, li gorî wê kar tê kirin. Di heman demê de 4 kesê parastinê hene û 4 kes yên paqijkirinê di nava baxçe de hene, di sîstema gulîstana şehîdan de nabe ku xort bi tena xwe, an jî zarok bi tena xwe derbasî nava gulistanê bibin û di gulistanê de kafê jî heye ew jî girêdayî saziya malbatên Şehîd ye. Armanca bingehîn ji avakirina gulistana şehîdan ewe ku kêfxweşiya zarok û malbatan pêkwere. Daxwaza tevahî welatiyan jî ew e ku xwedî li baqijiya gulistanê derkevin û biparêzin. Ji ber ku gulistana şehîdan bi ked û xwîna şehîdan hatiye avakirin, pêwîste ku her kes xwedî lê derkeve.



## Pirtûka Pirsgirêkên Başûrê Kurdistanê ya ji arşîvên Brîtanyayê, hate çapkirin

Navenda Nûçeyan



**Merasîmek ji bo nasandina pirtûka Pirsgirêkên Başûrê Kurdistanê ya di arşîvên Brîtanyayê yên di navbera salên 1918-1926’an de ku ji aliyê Profesor Dr. Rencder Mihemed ve hatî nivîsîn ku gelek belge û raporên dîrokî yên giring tê de cih digire, hate lidarxistin.**

Rêxistina Çand û Hunerê ya Yane û Siyaçemane ya li Helebceyê, ji bo nasandina pirtûka Pirsgirêkên Başûrê Kurdistanê ya di arşîvên Brîtanyayê yên di navbera salên 1918-1926’an de ku ji aliyê Profesor Dr. Rencder Mihemed ve hatî nivîsîn, merasîmek lidarxist.

Cîgirê Rêveberê Zanîngeha Helebceyê û nivîskarê pirtûkê Dr. Rencder Mihemed di derbarê mijarê de ji Rojnews’ê re axivî û wiha got: “Pirtûka min beşek ji belgeyên ku min dema nivîsandine teza xwe ya doktorayê li Brîtanyayê berhev kiribûn û wergerandibû Kurdî ye. Niha wek pirtûkekê hatiye çapkirin ku ji 538 rûpelan pêk tê. Belgeyên di vê pirtûkê de li Kurdistanê nîne ji ber ku bi fermî hatine tomarkirin û nehatine çapkirin û bi zehmetî peyda dibin. Ev yek jî destkeftiyek giringe ji bo xwendevanan e.”

Dr. Rencder Mihemed di dewama axaftina xwe de qala naveroka pirtûkê kir û wiha pê de çû: “Di pirtûkê de beşek ji dîroka siyasî ya Kurdistanê di serdemeke aloz û tijî têkoşîna siyasî û bûyerên taybet ên Başûrê Kurdistanê de tê vegotin û daneyên li ser Kurdistanê hene. Ji aliyê siyasî ve hatine nivîsandin, girîngiyeke wan a taybet heye. Me ji bo xwendevan û lêkolînerên din jî wan bibînin, karek wiha li ser kir. Di nav pirtûkê de belgeyên taybet, raporên hevdîtinan, konferansên hikûmetê, telgraf û nameyên di navbera rayedarên hikûmeta Brîtanyayê de, rojname û destnivîs hene.”

Rewşenbîrê Hewramî Eyub Rostem di derbarê heman mijarê de got ku: “Pirtûka Pirsgirêkên Başûrê Kurdistanê ya di arşîvên Brîtanyayê yên di navbera salên 1918-1926’an de pirtûkeke hêja ye, ew di çarçoveya xebatên kurdolojiyê de ye. Divê ev belge li ber destê her xwendevanekî hebin. Ji ber ku behsa qonaxeke gelek girîng di dîroka Iraqê de dike ku xewina dewleteke Kurdî hatibû binaxkirin.”

Sudoku: Bersiv 66

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 3 | 5 | 8 | 1 | 7 | 9 | 4 | 6 |
| 9 | 4 | 8 | 6 | 5 | 2 | 1 | 7 | 3 |
| 1 | 6 | 7 | 3 | 9 | 4 | 5 | 2 | 8 |
| 3 | 7 | 9 | 4 | 8 | 5 | 2 | 6 | 1 |
| 8 | 2 | 1 | 9 | 6 | 3 | 4 | 5 | 7 |
| 6 | 5 | 4 | 7 | 2 | 1 | 8 | 3 | 9 |
| 7 | 1 | 2 | 5 | 3 | 8 | 6 | 9 | 4 |
| 5 | 9 | 3 | 1 | 4 | 6 | 7 | 8 | 2 |
| 4 | 8 | 6 | 2 | 7 | 9 | 3 | 1 | 5 |

Sudoku:Pirs 67

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 4 | | 8 | | 2 | 3 | 1 | 7 |
| | 5 | | | | 7 | 4 | | |
| | | | | | | 9 | | |
| 8 | | 4 | | 7 | | | | |
| | 3 | 7 | | | | 1 | 5 | |
| | | | | 4 | | 8 | | 3 |
| | | 2 | | | | | | |
| | | 5 | 1 | | | | 3 | |
| 6 | 8 | 1 | 5 | | 9 | | 4 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Qazî bixwe çû pek neanî, mûyek ji riha xwe rêkir:**
- Ew bixwe nikare bike hina li ser navê xwe rêdike.

**Riha xwe diqusîne dû re eynikê tîne:**
- Karê ku destpêkê bike pişt re dike; karê bêsûd dike.

**Tajî ye/tajiya xelkê ye:**
- Pir dixebite lê berhemê keda wî ne jê re ye; ji xelkê re dixebite.

**Tiştek jê girê neda:**
- Tiştek jê fêm nekir; tiştek bi dest nexist; tiştek jê negirt.

**Tortore ye:**
- Bi tiştên beredayî ve mijûl dibe; karê bêsûd dike.

**Tu hezar carî jî avê bikutî dîsa av e:**
- Tiştek jê dernakeve; nahêje ku mirov biceribîne; karekî bêsûd e.

**Vegeriya dest li pişt qûnê:**
- Tişta pê ve çûyê bi dest neket; destvala vegeriya.

**Weke dohnê tu li qûna berêz bidî:**
- Ji bo karê bêsûd tê gotin.

**Yekî jina xwe berdabû ji nû ve digot were em bibin yar:**
- Di dema wê de qencî nekiriye, piştî ku her tişt ji dest çûye nû behsa qenciyê dike.

**Yê xwedîdew çû cem yê bêdew alîkarî xwest:**
- Yê dewlemend alîkarî ji yê xizan xwest.

**Zêdebûna ser kezebê ye:**
- Ti karê wî nagihe min; bêsûd e.

**LI SER KESÊ LI DÛ TIŞTÊN BEREDAYÎ DIKEVE**

**Aş çûye ew li pey çeqçeqokê ketiye:**
- Xema tiştên girîng naxwe, li dû tiştên beredayî ketiye.

**Goşt hiştiye, li pey serûpiyan ketiye:**
- Bi heman wateyê.

**Hesp ji dest çûye, ew li pey hevsar ketiye:**
- Bi heman wateyê.

**Kerî bi kerîtî çûye hê qerûşqerûşa wî ye:**
- Tiştek li meydanê nemaye hê ew li pey tiştên piçûk ketiye; li pey tiştên mezin nakeve ketiye xema tiştên piçûk.

**Mal çûye talan e, heyfa zengilê beran e:**
- Xema tiştên girîng naxwe, li dû tiştên beredayî ketiye.

**Zêr winda kiriye li pey moriyan ketiye:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Çareseriya kirîzên Rojhilata Navîn Neteweya Demokratîk e’



Li Rojhilata Navîn ji bo berjewndiyên hêzên desthilatdar her ku diçe kirîz, şer û alozî kurtir dibin Endamê PYD`ê Abdulkerîm Abdurihman diyar kir ku kilîta çareseriya tevahiya kirîzên Rojhilata Navîn, çareserkirina doza gelê kurd û filestînê ye.**R-4**

## Çeteyên DAIŞ’ê; avabûn, şikestina li ser destê QSD’ê û xeteriya domdar

DAIŞ’ê di 13’ê Nîsana 2013’an de bi destekdayîna dwleta Tirk a dagirker hate avakirin, li Sûriyê û Îraqê komkujî û kiryarên herî qirêj li ser gelên herêmê pêk anî. Di 23’ê Adara 2019’an de QSD’ê wekû kawayên serdemê zincîrên koletiya ku DAIŞ’ê dest û lingên gel bend kiribû, şikand û li Baxozê berdewamiya destaneya serkeftinê ya ku ji Kobanê destpêkiribû bi dawî kir.**R-5**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar : 1154  24-Adar- 2024  www.ronahi.net/ku/

# NÛJIYAN ERHAN BÛ ÇIRAYA TÊKOŞÎNA JINÊN ŞENGALÊ

Nûjiyan Erhan him gêrîlatî dikir him jî kar û xebatên ragihandinê dida meşandin. Dixwest bi riya çapemeniyê danasîna gêrîlayên jin bike, ji ber vê yekê wêneyên gêrîlayên jin û çîrokên wan kom dikirin. Dema Fermana 73’an li Şrngalê çêdibe, heval Nûjiyan Erhan wek rojnemevaneke jin ya yekemîn bi ekîpekî re derbasî Şengalê bû. Nûjiyan Erhan û hevalên xwe bi riya çapemeniyê fermana 73’an ya Şengalê bi cîhanê dan naskirin. Heval Nûjiyan erkê wê yê bingehîn ew bû ku di şengalê de ragihandina jin ava bike. Ew ji hemû jinan re bû çavkaniya hêvî û baweriyê, wê bingeha ragihandina azade û çapemeniya jin da avakirin. Her Nûjiyanek şehîd bibe, wê bi hezaran Nûjiyan şopa wê dewam bikin û armanca wê pêk bînin.**R-2**







## Seydayê Tîrêj; Bilbilê helbest û doza Kurdistanê



Helbestvanê helbesta resen nemir Seydayê Tîrêj ji bilî nivîsandina helbest û çîrokan, têkoşîneke ramyarî jî meşandiye. Helbestên xwe ne tenê li ser evînî û xemgîniyê divîsand, lê di helbestên xwe de bi dengekî bilind bangî keç û xortên kurdan dikir ku bi rola xwe ya dîrokî rabin.**R-7**



## ‘Em ê dengê Silêman Ehmed bighînin cîhanê’

Endama Desteya Rêveber a Ragihandina Azad Evîn Ibrahîm diyar kir ku ew wekî Yekîtiya Ragihanda Azad û rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo azadiya Silêman Ehmed gelek çalakî li dar xistine.**R-3**

## Têkoşerê Fedayî û pêşengê doza azadiyê; Şehîd Cûdî Gabar



Ji bo tolhildan şehîdan û rizgarkirina Efrînê, Hêzên Rizgariya Efrînê di 30’ê Çileyê de çalakiyeke fedayî li dar xist û yek ji yek ji fedayiyên vê çalakiyê ku bû pêşengê doza azadiyê, şehîd Cûdî Gabar e.**R-6**



**Mizgînî û encamên wê!**
Ahmed Aktaş  R-4



**Cehşokan xwîna Ehmedê Xalid Mamo badilhewa kirin**
Idrîs Henan  R-5

# Şehîd Nûjiyan bû çiraya têkoşîna jinên Şengalê

Nûjiyan Erhan him gêrîlatî dikir him jî kar û xebatên ragihandinê dida meşandin. Dixwest bi riya çapemeniyê danasîna gêrîlayên jin bike, ji ber vê yekê wêneyên gêrîlayên jin û çîrokên wan kom dikirin.Dema Fermana 73'an li Şrngalê çêdibe, heval Nûjiyan Erhan wek rojnemevaneke jin ya yekemîn bi ekîpekî re derbasî Şengalê bû. Nûjiyan Erhan û hevalên xwe bi riya çapemeniyê fermana 73'an ya Şengalê bi cîhanê dan naskirin. Heval Nûjiyan erkê wê yê bingehîn ew bû ku di şengalê de ragihandina jin ava bike. Ew ji hemû jinan re bû çavkaniya hêvî û baweriyê, wê bingeha ragihandina azade û çapemeniya jin da avakirin. Her Nûjiyanek şehîd bibe, wê bi hezaran Nûjiyan şopa wê dewam bikin û armanca wê pêk bînin.

**Ayşa Silêman / Qamişlo**

Di derbarê jiyana Şehîd Nûjiyan Erhan, herwiha kar , xebat û salvegera Şehadeta wê rojnemevana Ajansa ANHA'yê Hêlîn Asmîn bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hûn dikarin kesayet, kar û xebatên Şehîd Nûjiyan Erhan bînin ziman?**

Nûjiyan Erhan di sala 2015'an de demekî li herêmên Zagrosê û li çiyayên Kurdistanê dimîne, paşê derbasî çapemeniyê dibe, derbasî akademeya Gurbet Elî Ersûz dibe, piştî derbasbûna wê ji akadimiyê re derbasî Navenda Rajinê ya bingehîn li Çiyayên Kurdistanê dibe. Nûjiyan Erhan him Gêrîlatî dikir him jî rojnemevantiyê dikir, demeke dirêj di milê dîtbar, nivîskî de kar kir. Dixwest danasîna gêrîlayên jin bide diyarkirin bi riya çapemeniyê re, ji ber vê yekê wêneyên gêrîlayên jin û çîrokên wan pêşkêş dikir. Bi vî rengî karê xwe di çapemeniyê de dida meşandin, heta sala 2014' an feremana Şengalê çêbû. Dema Fermana 73'an li Şrngalê çêdibe, heval Nûjiyan Erhan wek rojnemevaneke jin ya yekemîn bi ekîpekî re derbasî Şengalê dibe. Nûjiyan derbasî Şengalê bû, ji ber ku dixwest ew jinên ku di ferman û komkujiyan de êş kişandine û hatine tecawiz kirin, bi riya Çapemeniyê re



van jinan ji Cîhanê re bide naskirin. Heta niha 73 ferman li Şengalê hatine kirin lê heta niha belgeyeke yan dîmenek fermî di dîrokê de nîne, lê Nûjiyan Erhan û hevalên xwe bi riya Çapemeniyê re ferman 73'an ya Şengalê bi cîhanê dan naskirin. Heval Nûjiyan erkê wê yê bingehîn ew bû, ku di şengalê de ragihandina jin avabike. Jin û ciwanên Şengalê jî dibêjin ku Ş. Nûjiyan ji me re bû hêvî, herwiha Nûjiyan Erhan bingeha ragihandina azade û çapemeniya jin da avakirin. Di heman demê de yek bi yek bi ciwanên Şengalê re mijûl bû û kar kir, heta niha li Şengalê Rojnemevanên jin li ser xeta Ş. Nûjiyan dimeşin û wê wek pêşenga xwe pênase dikin. Her sal dema salvegera heval Nûjiyan jinên Şengalê wê bibîr tînin. Raste demeke kin ez û heval Nûjiyan bi hev re man, lê min dît heval Nûjiyan çiqasî çalak bû, çi kar ketiban pêşiya wê digot ez ê bikim wek; Dîtbar, pêşkêşî, ji kovar û rojnameyê re nivîs dinivîsandin, ji ajans û televisyonê re nûçe çêdikirin û rêveberiya çapemeniya jin jî dikir, di heman demê de bernameyên pêşkêşî çêdikir, herwiha jinên ciwan fêrî karê ragihandinê dikirin. Bi riya heval Nûjiyan bingehek xurt ji bo jinan li Şengal hat avakirin.

**Çima PDK'ê Şehîd Nûjiyan Erhan hedefgirt?**

Ji avabûna ragihandina jin yan ragihandina azad heya roja me ya îro, êrîşên dagirkeriyê li ser jin û çapemeniyê hene, di heman demê de jinên kurd berxwedanî û têkoşîna wan heye. Ji Gurbert Elî Ersûz heta ya herî dawî Rohendayan re. Herî dawiyê li Zapê 4 hevalên çapemeniya YJA Star şehîd ketin. Ev tê wateya ku hemû heman zihniyetin, zihniyeta ku heval Nûjiyan Erhan li Şengalê şehîd xistî û zihniyeta ku Nagîhan Ekarsa û Denîz Firat şehîd xistin heman zihniyetin. Armanc wan ji vê yekê naxwazin rastiya wan eşkere bibe, bi êrîşên xwe dixwazin hebûna xwe diyar bikin, herwiha dixwazin jinên azad bêdeng bikin. Bi riya kuştin û tunekirin dixwazin dengê ragihandin, çapemenî û dengê jinê tunebikin. Heger Nûjyanek hat qetilkirin di heman demê de bi hezaran Nûjiyan şopa wê berdewam dikin. Em jî heta roja îro li ser wê xetê dimeşin.

**Hûn wekî rojnamevan, kiryarên PDK'ê yên wekî kuştin , revandin û işkencekirina rojnemevanên dengên azadiyê çawa dinirxînin?**

Revandina Silêman Ehmed, dewama zihniyeta girtin û revandina bi hezaran girtiyên din yên Bakurê Kurdistanê ye, ev zihniyet nahêle ji bilî deng, reng û hebûn wî tiştek hebe. Dixwazin bi riya girtin, kuştin û ji derveyî qanûnê jî hin gavan diavêjin. Girtina Silêman Ehmed û şehîdxistina Nûjiyan Erhan û heta roja îro girtina bi dehan rojnemevanên kurd, ev yek ji hev venaqetin, ji ber ku pergala desthilatdar naxwaze tu deng ji yê wan pêve pêşbikevin. Ji ber vê yekê êrîşên xwe dûbare dikin, herî dawî li Bakurê Kurdistanê bi hezaran rojnemevan hatin girtin û hatin berdan jî, lê ya Silêman Ehmed her tişt ji derveyî hiqûqî tê meşandin, îro PDK'ê Silêman Ehmed revandiye ne qanûn û ne jî mafên wî tên naskirin, ne jî pîvanên wî yên rojnemevantiyê. Zihniyeta ku rojane li Başûrê Kurdistanê li ser kurdan kuştin û dijminatî tê kirin. Herwiha ev yek bi girtina Silêman Ehmed ve girêdayî ye, tevî ku rojane parêzer serlêdana wî dikin û Roj Newz bi dehan daxuyanî dan û rojnemevanên cîhanî jî serlêdana Silêman Ehmed kirin, lê heta niha PDK'ê hebûna wî pênase nakin û cihê wî jî diyar nakin ji malbata wî re. Girtina Silêman û qetilkirina Zelal Zagiros ev zihniyeta desthilatdar ya hev pare ji hev qutnabe, herwiha zihniyeta ku îro Erdogan, PDK' û hêzên desthilatdar dixwazin bidin meşandin yek zihniyete. Li hember vê yekê mirovên lêgervan û bi taybet lêgervanên heqîqetê tu carî serî natewînin, heval Nûjiyan Erhan, Gurbet Elî Ersûz û Denîz firat, herwiha bidehan rojnamevan di zindanan de li ber xwedidin û serî li ber desthilatdariyê natewînin û tekoşînê dikin. Li ser rêka heqîqetê bi pênûs, ked û wênekêşa xwe dixwazin rastiya heyî derxin holê û ji vê rastiyê dûr nakevin. Em jî wek rojamevan em ê li ser xeta wan bimeşin û heta dawiyê em ê li ser xeta wan meşa xwe berdewam bikin.



# Bi xebata xwe aboriya xwe ya serbixwe bi dest dixin

**Kejal û Saniya du jinên kedkar in û li navçeya Hewraman dijîn, biryar didin bi hev re cihê kar vekin û ji alozî û pirsgirêkên derûnî dûr bikevin, dahata jiyana xwe û malbata xwe bikin.**

Li ser riya gundê Zerdehal û devera Biyare ya navçeya Hewramanê, Kejal Osman û Saniya Elî firoşgehek bi navê 'Nafa' vekirine û bi hev re hem kar dikin ji bo di aliyê derûnî de bi aram bibin û hem jî nan, kade, şêlim, peqle û çay difiroşin û debara malbatên xwe dikin.

Kejal Osman xelkê gundê Kunmasî ye û li Şarbajêr a girêdayî bajarê Silêmanî ye lê nîştecihê navçeya Hewraman e. Piştî ku hevjînê wê yê pêşmerge birîndar dibe û nikare kar bike, Kejal Osman biryar dide bi xwe dest bi kar bike û li gel Saniye ji bo xwe firoşgehekî vedikin.

**'Mijûlbûn mirov bi aram dike'**

Kejal Osman der barê karê xwe de wiha dibêje: "Ev mehek e me ev firoşgeh vekiriye û saet 6:00'ê sibehê heta 7:00'ê êvarê kar dikin. Nexweşiya min a dil heye lê ji ber tunebûna mûçe di mala min de pencere nîn e û rewşa me jî nebaş e. Ji ber vê jî min biryar da bi xwe kar bikim. Ji ber ku karê bi keda destên mirov baştire û mirov dikare bi keda destên xwe debara mala xwe bike û di aliyê derûnî de jî mirov aram dibe."

**'Xebat bû sedem ku kêfxweş bibim û ji pirsgirêkan dûr bikevim'**

Saniye Elî jî li gundê Zerdehal dijî û li gel Kejal biryara vekirina cihê kar dane û der barê xebata xwe de wiha got: "Bê mûçetî, li malê em bê taqet kirine. Karê me hem ji bo mal baş e û hem jî ji bo barê darayî jî başe. Em bi daxwaza xwe kar dikin, zarokên min dibêjin kar neke lê bi xebatê ez kêfxweş im."



Saniye, ji ber keça wê nexweş bû di aliyê derûnî de rewşa wê gelek nebaş bûye lê bi xebatê derûniya wê jî baş bûye û wiha dibêje: "Hinek caran dibû sedem ku ez gelek aciz dibûm. Min ji zarokên xwe re digot derbikevin ji derve ku ez têr bigrîm û dawî bibe. Lê belê niha çav û guhên min vebûye û tu pirsgirêkên min nîn e. Ger li malê bimînim dê her dem bêhan min teng be û wê pirsgirêk derbikevin. Lê dema ku bi kar re mijûl dibim di aliyê bedenî û derûnî de bi aram û kêfxweş dibim." **NÛJINHA**



# Seydayê Tîrêj; Bilbilê helbest û doza Kurdistanê

Helbestvanê helbesta resen nemir Seydayê Tîrêj ji bilî nivîsandina helbest û çîrokan, têkoşîneke ramyarî jî meşandiye. Helbestên xwe ne tenê li ser evînî û xemgîniyê divîsand, lê di helbestên xwe de bi dengekî bilind bangî keç û xortên kurdan dikir ku bi rola xwe ya dîrokî rabin.

**Navenda Nûçeyan**

Mamoste û helbestvanê helbesta resen nemir Tîrêj di sala 1923`an de li Nicmok yê girêdayî bajarê Qamişlo hatiye dinê. Navê wî yê rastî Mele Nayif e Heso ye. Gava ku temenê Tîrêj dibe 6 salî, bavê wî mala xwe koç dike û li gundê Sêmitikê bi cîwar dibin. Tîrêj li wê derê û li cem Mele Îbrahîmê Golî, Quranê û çend pertûkên olî dixwîne. Wek gelek helbestvanên kurdan, ew jî di dibistana olî de dest bi xwendin û nivîsandinê dike.

**Tîrêj; ji bilî nivîsandina helbestan, têkoşîneke ramyarî jî meşandiye**

Tîrêj di sala 1937'an de hatiye bajarê Amûdê û li wê derê dest bi dibistanê kiriye. 5 salan li dibistana bajarê Amûdê xwendiye. Lê ji ber mercên aborî xwendina xwe nedomandiye. Li wê derê, têkiliyên wî bi helbestvanên mezin Cegerxwîn, Qedrî Can, Hesen Hişyar û Nûredîn Zaza re xurt bûye, ev têkilî bandora evîna helbestnivîsandinê di dilê wî de gul vedide. Bi wan re xebata niştimanperweriyê kiriye û wek gelek welatperwer û rweşenbîrên Kurdan, Seydayê Tîrêj jî, di nava civata xwebûn/xoybûnê de cihê xwe girtiye. Li gel nivîsandina helbest û çîrokan, têkoşîneke ramyarî jî meşandiye.

**Banga Seyda; keç û xort bi rola xwe ya dîrokî rabin**


Seyda di sala 1952`an de bi destê desthilatdariya wê demê tê girtin û dîwanek ji helbestên wî yên ne belavbûyî jî tê talan kirin. Piştî ku Seyda ji zindanê reha dibe, berî dide nav Erebên Cibûran û ji neçarî demek pir dirêj xwe li nav wan diparêze. Di sala 1973'an de berî dide bajarê Hisiça û li wir bi cîwar dibe. Di 23'ê Adara 2002`an de diçe ser koça xwe û li gundê Girkeftar hat veşartin. Herwiha mamostayê mezin û bi nav û deng Cegerxwîn di dîwana xwe ya (Kî me Ez) de, li ser Seydayê Tîrêj, bi navê wî yê rastî (Nayifê Heso) helbestek nivîsandiye û hêviyên hêja ji wî kiriye. Seydayê Cegerxwîn di wê helbesta xwe de weha dibêje -Seyda ne tenê li ser heskirina keç û xortan nivisandiye, lê belê rola keç û xortên xwendevan di rêvebirina kar û xebatê de mîna serê rimê dibîne û bi dengekî bilind hawar û gaziya xwe digihîne xortên xwendevan û ji wan dixwaze ku bi rola xwe ya dîrokî rabin:

Xortê jîr û xwendevan çare û hêviya netew
Rabe ji xew tu carek serê roja me derket
Xwe rapêçe birader ji bo kar û xebatê
Kes nema ye di xew de cîhan pêkve li hev ket
Li çar kenar û hawêr şer û halan û ceng e
Karwanê riya jînê binêre va bi rê ket
Li şûnwara nemînî dem pir xwêş e birader
Divê wextê nemane tu kes bê al û şewket

**Seyda; helbestên xwe bi hunerek mezin û bilind hûnandiye**

Seyda, gelek stranên folklorî bi kêş û serwe hûnandiye. Ew stran ji mirinê reha kiriye û sipehîbûn û qeşengî bera rewanê wê daye, di heman demê de bi hunerek pir mezin û bilind hûnandiye. Mîna: Siyamend û Xecê 335 cotmalik in, Sîpan û Perwîn 400 cotmalik in û Ciwan û Kejê jî 421 cotmalik in. Weharenge bi dîrok û mêjûwa gelê xwe ve jî girêdayî bû, leheng, mêrxas û navdarên dîrokê di helbestên xwe de aniye ziman. Pesnê dîroka gelê xwe dida û her û her digot:

Bihûştek Xwedê ye li xakî zemîn
Berê ew bi navê Meya Farqîn
Ne dûre ji havîngehên ber Fêrat
Bi nav û bi deng bûye bûka welat
Ji beriya hezar sal Meya Farqîn
Dibû dewletek serbixwe nazenîn
Dema bûye dewlet bi serxwe'v dihat
Helebesa Seydayê Tîrêj ya bi navê Ey welat
Ey welat ez can fidayê, deşt û zozanê te me
Can fidayê av û dehl û bax û bîstanê te me
Sûnd û peyman bî, li ser min, dê te parêz kim welat
Xwîna narincî birêjim, merdê pêwanê te me
Dest li ser darê tifing im, şog ji erdê nabirim
Pa Sîpan û leşkerê armanc û nîşanê te me
Can bisojim, dê bi pêt û agirê cenga welat
Agirê Zerdeşt bî, ez bi xwe perwanê te me
Bostekê ez ji te nadim, bi welatê Hind û çîn
Tu bihişta millt e, ez şûr û gerdanî te me
Dê bibirim, ez bi şûr û xenceran, destê çepel
Hîmê bintar û asasê, birc û eywanê te me



Dê bi hêz û hinera xwe, ez te parêz kim welat
Ala rengîn jor ve hildim, ez li ser banê te me
Rengê tîrêj û birûskan, dê xwe berdim ser neyar
Ser bind im bê guman, pêşmergê Barzanî te me

**Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

-Dîwan Xelat
-Dîwana Zoza
-Dîwana Cûdî
-Serpêhatiyên Kurdan

**Berhemên wî yên neçapkirî :**

-Xelata roja helbestên Kurdî li Sûriyê 1995`an.
-Xelata 100 saliya Rojnemevaniya Kurdî. 1998`an de li Hewlêr.
-Xelata Koma Helecayê ya Folklorê Kurdî li Cezîrê- Hisiçe 2001`an de.

# Çand hevgirtin û yekîtiya civakê ye

**Rohat Bulut**

**Mirovan bi hêsanî civakbûyîn ava nekirine. Dem û dîrokeke dirêj, mirov wekî hemû zindîwarên din takakesî jiyane. Çi ji ber şert û mercên xwezayî û çi jî ji ber jîndarên din gelek zor û zehmetiyên mezin kêşane.**

Mirovan bi hêsanî civakbûyîn ava nekirine. Dem û dîrokeke dirêj, mirov wekî hemû zindîwarên din takakesî jiyane. Çi ji ber şert û mercên xwezayî û çi jî ji ber jîndarên din gelek zor û zehmetiyên mezin kêşane. Her kêliya jiyanê bi dîtin, bihîstin, hest û hîsan tecrube kirine. Li gorî tecrubeyan ji bo xwe qada jiyanê ava kirin e. Bêguman ev qonexeke dûr û dirêje ku bi xwe re rê li ber şoreşên mezin vekiriye. Em ji hemû bermahiyên bi destê mirovan hatine afirandin re çand dibêjin. Çand wekî hemû berheman bi destên mirovan ji hest, raman û fikrê mirovan hildibere. Yanî hilberînek ji manewiyatê ye. Ew manewiyate ku civakbûyînê diafirîn e. Belê çand û pergelên çandî ne tenê di warê madî de, di heman demê de bi nirxên xwe yên manewî û exlaqî mirovahî û civakbûyînê pêş dixe. Di heman demê de çand di navbera mirovan de rista gihandina hev û avakirina yekitiyê dileyze. Tu pergaleke civakî-çandî ji nişka ve mîna ku ji ezmanan ve hatibe, derneketiye holê. Di gelek qonaxên dijwar re derbas bûye. Di heman demê de wendabûna wê jî ji nişka ve pêk nayê. Wekî civaka kurd her çiqas di warê bawerî û çandî di çerxeke dijwar a dewlet, şaristanî û baweriyên serdet re derbas bûbin jî hêj çand û baweriya xwe ya resen dijîn. Çawa ku her civak xwedî dîrokek e, divê bê zanîn ku ew dîroka civakê bi çanda wê ya ji hezarê salan ve tê teşe girtiye.

**Rabûrdiya mirovahiyê**

Li vir a girîng ew e ku her mirov xwedî hişmendiyek xwenasiyê be. Heke mirov serboriya civak û mirovahiyê nizanibe, bi tevahî fêhm neke û weteyê nedê dê nirxandina aîdatên mirov û civakê jî kêm be. Lewre serpêhatiyên salan ên civakan û qonaxên ku tê re derbas bûne, bi hêsanî nebûye. Dîsa ku mirovên rabûrdiya mirovahî û civakbûyînê nizanibe dê ji çanda madî û manewî jî tiştekî fêhm neke. Ji lewre jî her çand xwedî rabirdûyeke zindî û domdar e.

Ji ber vê yekê dema em bala xwe didinê; bi hêsanî em dibînin ku di nava ferdên heman civakê de bi çanda madî û manewî hevpariyek heye. Ev çand e ku rê li ber rewşeke hevpar, hiş û hişmendiyeke hevpar, bi kurtî nasnameyeke hevpar vedike. Di navbera ferdên civakekê de ku di pêvajoyeke dîrokî ya dirêj de girêdanên xurt û neşikestî çêdibin. Çêbûneke hevpar a derûnî, giyanî, wekhevî û hevpariyeke jiyanî ye. Van binyadên heyî yên çandî, nirxên derûnî yên hevpar û taybetmendiyên herî bingehîn in. Ji ber vê yekê jî bawerî, hest û ramana hevpar û ev pêkhatina giyanî ya di nava ferdên civakê de ku ji heman çandê têrbûyî, weke qadeke ku civakê digihîne hev, bi hêz dike û li ser piyan digire ye. Ev girêdanên giyanî û exlaqî



yên hevpar, li pêşberî her cure tofanên herî dijwar jî civakê li ser piyan dihêle.

**Dixwazin mîrateya çandê tune bikin**

Aşkera ye ku hemû hêzên serdest ên kolonyalîst û emperyalîst ji dîrokê heta niha ji bo civakê lewaz bikin, civakbûyînê ji holê rakin, berxwedana civakê bişkînin û tune bikin bi her awayî çandê ji xwe re dikin hedef. Dixwazin mîrateya civakê ya çandî û dîrokî tune bikin û rê li ber tarîtiyê vebikin. Lewma jî bi her awayî êrîş dikin. Ev rêbaza herî zêde ku serdest bi kar tîne ye. Civaka kurd, yek ji wan civakan e ku herî zêde dewlet û desthilatan êrîşî çanda wê kiriye û hîna jî rastî êrîşên dijwar tê. Ji ber vê yekê em wekî kurd dikarin baştir fêm bikin; dewlet û desthilatan her tim hewil daye dîroka kurdan serobino bikin, nirxên wan talan bikin, dewlemendiyên çandî bi tevahî desteser û wêran bikin, yekîtî û tifaqa wan bişikînin, lewma jî her cure êrîş pêş xistine.

# Têkoşerê Fedayî û pêşengê doza azadiyê; Şehîd Cûdî Gabar

**Ji bo tolhildan şehîdan û rizgarkirina Efrînê, Hêzên Rizgariya Efrînê di 30'ê Çileyê de çalakiyeke fedayî li dar xist û yek ji yek ji fedayiyên vê çalakiyê ku bû pêşengê doza azadiyê, şehîd Cûdî Gabar e.**

**Zana Roj/ Şehba**

Di 30'ê Çileya 2024 an de Hêzên Rizgariya Efrînê li hembere dagirkerkiya Tirkiyê û komên Çeteyan ve çalakiyeke fedayî bi pêşengtiya 5 qehremanan dan destpêkirin. Yek ji pakrewanên vê çalakiya pîroz Ş. Cûdî gabar e.

Ş. Cûdî Gabar xwedî malbateke bi nirx û welatparêz yên herêma Efrînê ye. Şehîd Cûdî di sala 2014 an bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re tevlî nava refên Yekîneyên Parastina Gel bû ye. Di 30'ê Çileya 2024 an de û di çalakiya fedayî ya Hêzên Rizgariya Efrînê li gundê Basilê tevlî kerwanên Şehîdan dibe.

### Jiyana şehîd Cûdî Gabar

Cemîl silêman bi nas nav (Cûdî Gabar) di sala 2001'ê de li gundê Bircika Silêmên a girêdayî navçeya Şêrawa ya herêma Efrînê ji dayîk bûye û ew kurê tenê yê malê bû. Ş.Cûdî di nava malbatê de zarokê herî biçûk di nava malbatê de bû.



Ş. Cûdî bi hebûn û dîtina xwe di nava malbateke welatparêz de, li ser fikir û felsefeya Rêber APO mezin bû. Bi hatin û çûyîna gerîlayên azadiyê ji mala bapîrê wî re û tevlîbûna Xaltîka wî ji salên 90'î ve ji nava refên tevgera azadiyê wê demê Ş. Cûdî êdî hîn baştir rastiya fikira têkoşîna azadiya Kurdistan nasdike. Bi destp;kirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re Ş. Cûdî dema li gund bû li ser destê hin komên çete ku derbasê gund bibûn hat revandin û piştî demekê serbest hat berdan. Ev bûyer di jiyana Ş. Cûdî de têgihîştina heqîqeta gelê Kurd û tevlîbûna nava refên tevgera azadiya Kurdistan mezintir kir.

Di sala 2014 an de bi lawê xaltîka xwe re tevlî Yekîneyên Parastina Gel dibe û bi navê (Cûdî Gabar) tê naskirin. Di pêvajoya Berxwedana Serdemê ya qonaxa yekemîn bi hev re şer dikin û di wê berxwedaniyê de kurê xaltîka wî Ş. Pêşeng Şehîd dikeve.

### Ş. Cûdî cihê xw di nava Hêzên Rizgariya Efrînê de digire

Di encama hovîtiya dagirkeriya Tirkiyê li ser herêma Efrînê û piştî 58 rojan ji berxwedaniyê. Gelê Efrînê di 18'ê Adara 2018 an de bi darê zorê koçberî herêma Şehbayê dibin. Bi vê pêvajoyê re ragihandina berdewamkirina qonaxa duyemîn a berxwedana Serdemê tê destpêkirin û Hêzên Rizgariya Efrînê tê ragihandin. Ş. Cûdî bi vê yekê re tevlî Hêzên Rizgariya Efrînê dibe.

Yek ji çalakiyên herî pîroz û girîng çalakiya fedayî ya Hêzên Rizgariya Efrînê li hember dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyên girêdayî wê di 30'ê Çile de li gundê Basilê bû. Di wê çalakiyê de 5 pêşengên xeta têkoşînê cihê xwe tê de digirin û Ş. Cûdî yek ji wan pêşengan bû.



### `Bi temenekî biçûk barekî giran girt ser milê xwe`

Têkildarî jiyana Ş. Cudî dayîka wî Zêneb Silêman ji rojnameya me re axivî û wiha behsa jiyan û hezkirina wî ji tevgerê re kir:"Şehîd Cûdî xwedî hezkirinek mezin li hember malbat û hevalên xwe bû. Di nava malbatê de dihat hezkirin û gelekî jêhatî bû. Hezkirina wî ji tevgera azadiyê re roj bi roj mezin dibû û bi taybet jî dema ku temenê wî 12 salî bû biryar da ku tevlî bibe. Lê ji ber hevalan qebûl nedikir di wî temenî de tevlî bibe, got ku temenê min 17 salî ye. Wê demê min jê re got hîn tu biçûkî divê tu hinekî din mezin bibê û piştire tevlî tevgerê bibê, lê belê di temenekî biçûk de barekî giran girt ser mile xwe".

Herwiha dayîka Zeyneb bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Li ser xeta têkoşîn û azadiyê emê riya Şehîd Cûdî berdewam bikin. Ez şehadeta wî diyarî Rêber APO û hemû dayîkên Şehîdan dikim. Wê bi fedayîtiya van qehremanan tu carî dijmin negihîne armancên xwe".

# Şaredariya Qamişlo dest bi kar û xebatên xwe yên biharê kir

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

**Projeyên Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo yên sala 2023`an ku ji ber sedemên avhewayê hatibûn sekinandin, careke din dewam dikin. Rêveberê Ofîsa Fenî ya Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo Ednan Ehmed diyar kir ku ji bo xizmeta civakê wê kar û xebat berdewam be.**

Bi hatina werzê zivistanê, şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo hin projeyên xwe yên xizmetguzariyê yên wekî çêkirina riyan yên sala 2023'an da sekinandin, bi destpêkirina bihara 2024'an şaredariyê careke din dest bi xebatên qedandina van pirojeyan kir.

Derbarê mijarê de Rêveberê Ofîsa Fenî ya Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo Ednan Ehmed



ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Ji ber sedemên avahewayî xebatên projeyên sala 2023`an hatibûn sekinandin û tenê bi pileya ji sedî 40 hatin pêkanîn. Lê bi başbûna avhawayî û bi hatina werzê buharê di sala 2024`an dîsa şaredariyê dest bi xebatên xwe kir."

Ehmed wiha axaftina xwe dewam kir: "Me xebatên xwe bi berdewamkirina danîna kevirên şikestî li taxên bajarê Qamişlo yên mane destpê kir ku bi mîqdara 5hezar M3 bû. Projeya me ya nû destpêkirina danîna kevirên şikestî li taxa Hilko ye. Piştî bi dawîbûna vê taxê wê şaredarî dest bi taxên cuda bike weke beşa rojhilat û taxên cuda ji bajarê Qamişlo. Herwiha piştî bidawîbûna projeya danîna kevirên şikestî li taxan piştî demeke din wê bên ziftkirin. Ji xebatên projeyên me jî rêyên ku xirabbûne, ne rastin û gelek çal tê de hene wê bên sererast kirin û kevirên şikestî bên danîn."

Ednan Ehmed derbarê projeyên 2024'an wiha got: "Gelek projeyên me yên din hebûn weke projeya qîrkirinê bi mîqada 6hezar M3 hat pêkanîn û bi temamî proje bi dawî bû. Li bazara sebzeyan jî projeya kevirên enterlokê hat pêk anîn.



Projeyên sala 2024`an wiha ne; Projeyên pêşerojê yên hatine hildan ji bo bên pêkanîn (Dergeha rojhilat a bajarê Qamişlo, xetên avê û binesaziya herêmê) bi giştî ye her wiha projeya ziftkirinê. Herwiha 2 şaredarî girêdayî şaredariya Qamişlo hene, şaredariya Tenûriyê û Girbawî, projeyên şaredariya Girbawî bi temamî hatin pêk anîn beşek ji hêla şaredariya me û beşa din ji taybet hat pêk anîn. Şaredariya Girbawî projeya danîna kevirên şikestî beşeke jê gihaştin ji sedî 40."

Ednan Ehmeddi dawiyê de wiha got: "Weke şaredariya Qamişlo em kar û xebatê xwe dikin û projeyên sala 2023`an berdewam dikin û li hêviyê ne ku erêkirin bê dayîn ji bo projeyên sala 2024`an dest pê bikin."



# 'Em ê dengê Silêman Ehmed bighînin cîhanê'

**Endama Desteya Rêveber a Ragihandina Azad Evîn Ibrahîm diyar kir ku ew wekî Yekîtiya Ragihanda Azad û rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo azadiya Silêman Ehmed gelek çalakî li dar xistine û wiha got: "Ji bo eşkerekirina çarenûsa Silêman Ehmed me xwe gihand hin saziyên mafên mirovan yên li ser asta Rojhilata Navîn û cîhanî, herwiha wê çalakiyên me jî berdewam bin"**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Xiyaneta PDK`ê ya li hemberî gelê kurd bi 10'ê salan dewam dike. PDK`ê bi dijminê gelê xwe re dibe hevalbend ji bo ku deng û berxwedana gelê kurd ji cîhanê veşêre, rojnemevanên şopidarên rastiyê armanc dike, da ku rastî dernekeve û dijmin bi rehetî sûcên xwe li ser kurdan pêk bîne. Û yek ji berxwedêrên ronîkirina rastiyê ku bûye armanca sûcên hovane yên PDK`ê rojnemevan Silêman Ehemed e.

Silêman Ehmed di ajansa Rojnews'ê de xebatên edîtoriya beşê Erebî dikir, dema ku di 1`ê Cotmeha 2023`an ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê û 25`ê Cotmehê de, dema xwest di deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê PDK`ê ve hat revandin û heta niha agahî jê nayê girtin. Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK`ê ya Dihokê bi daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast gotin ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandin e.

Derbarê revandina edîtorê beşa



Erebî ya ajansa Rojnews'ê rojnamevan Silêman Ehmed ji aliyê PDK'ê ve, endama Desteya Rêveber a Ragihandina Azad Evîn Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.

Evîn Ibrahîm diyar kir ku 5 mehin çarenûsa rojnemevan Silêman Ehmed ne diyare û wiha got: "Dema ku endamê Yekîtiya Ragihandina Azad Silêman Ehmed xwest vegere Başûrê Kurdistanê, ji bo ku xebatên xwe yên rojnemevaniyê berdewam bike, ji aliyê asayişa PDK`ê ve hat revandin û ev dibe nêzî 5 mehan çarenûsa wî ne diyare. Rojnemevan Silêman Ehmed bi fermi derbasî Rojava bibû, da ku serdana malbata xwe bike û bi awayekî fermî careke din vegere ser kar û xebatên xwe, lê dema vegerê de li deriyê Pêşxabûrê (Sêmalka) ji aliyê PDK`ê hat revandin. Herwiha revandin Silêman binpêkirinên yasayên di derbarê azadiya Rojnemevan de ne."

### 'Dengê Rojnemevan Silêman Ehmed bigîhin cîhanê'

Evîn Ibrahîm nerazîbûna Yekîtiya Ragihandina Azad ji revandina rojnemevan Silêman Ehmed nîşan da û wiha got: "Yekîtiya Ragihandina Azad û hemû rojnemevanên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di derbarê revandina rojnemevan Silêman Ehmed de nerazîbûna xwe nîşan dan. Herwiha me wek Yekîtiya Ragihanda Azad ji bo Silêman Ehmed gelek çalakî li dar xistin, hem me xwe gihand hin saziyên mafên mirovan yên li ser asta Rojhilata Navîn û cîhanî, ji bo ku em karibin dengê Rojnemevan Silêman Ehmed bigîhin cîhanê. Herwiha ji dema revandina Ehemd ve û heta niha agahî jê nayê girtin, ji ber PDK`ê hevdîtina parêzer û malbatê bi Silêman re asteng dike, lewra hin Saziyên Mirovî jî hewletên nerazîbûnê nîşan dan û mixabin hin sazî jî bêdeng man. Bi taybetî li Başûrê Kurdistanê dema ku em bi sendîkeyên rojnemevan re ketin têkiliyê de, sendîkya rojnemevaniyê ya bajarê Hewlêrê bê helwest ma, hinekî sendîkeya rojnemevaniyê ya Silêmaniyê hewlestinê xwe derxistin pêş, lê ne di wê asta ku karibin çarenûsa Silêman diyar bikin."



### 'PDK`ê gelek rojnemevan binçav kirine'

Evîn Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand: "Perpirsyariya Silêman Ehmed di destê Hikûmeta Başûrê Kurdistanê de ye, hikûmeta Başûrê Kurdistanê ev ne cara yekemîn ku rojnemevanan bi vî awayê hovane direvînin, ji ber ji dîrokê heta îro gelek rojnemevan binçav kirine. Herwiha azadiya rojnemevanêyê ya ku behsê dikin ne di wê asta ku tê xwestin, ji ber nêzîkatiyên hovane li hemberî rojnemevanên ku dixwazin riya heqîqetê bişopînin, dengê rojnamegeriya azad û gelê xwe bighînin cîhanê didin meşandin. Lê bera baş nas bikin ku rojnemevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê her wê li dû doza Silêman Ehmed de bin, bê guman gelek çalakî ji bo Ehmed hatin lidarxistin, lê di dema pêş de heger çarenivîsa Silêman Ehmed neyê diyarkirin wê helwetên me yên cudatir bên nîşandan. Û em ê li dû doza azadkirina rojnemevan Silêman Ehmed bimînin heta ku pênûsa rastiyê veger dîrokê binvîse û ronî bike."

# 5 sal derbas bûn, nîşaneyên xetereya DAIŞ`ê didomin

5 sal beriya niha çeteyên DAIŞ'ê di aliyê erdîngariyê de ji aliyê QSD'ê ve hatin qedandin. Lê di du salên dawîn de êrişên wan ên li ser Sûriyeyê zêdetir bûn. Ev dide nîşandan ku xetereya DAIŞ'ê hîna bi dawî nebûye. Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) 23`yê Adara 2019`an xewna çeteyên DAIŞ`ê ya "avakirina xîlafetê" li bajarokê Baxozê tune kir.

Piştî ku DAIŞ`ê li ser erdê bi bin ket bermahiyên wê xwe veşartin û dest bi stratejiyeke nû bi navê "gurên bi tenê" û şerê lêxistin û xweveşartinê di 5 salên dawîn de meşand. Di encamê de komkujî û sûcên xwîndar çêbûn. Nemaze ku hîna ezmûna wê ya leşkerî heye û endamên wê pispor in û xwe li herêmên çolistana Sûriyeyê veşartine. Li gorî fermandarên QSD`ê hejmara wan nêzî 10 hezar çete ne.

Êrişa li ser girtîgeha Sînaayê di 20`ê Çileya 2022`yan, ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve ku şaneyên xwe yên veşartî bi kar anîn ji bo ku çeteyên di girtîgehên QSD`ê de birevînin, ji 2019`an ve êrişa herî berfireh e.

Di girtîgeha Sînayê de çeteyên tundraw ên ji 50 welatan hene. Dema êrişa li ser girtîgehê, tevlihevî û îsiyan çêbû, deriyên hucreyan hatin şikandin, ji ber wê gelek çete ji girtîgehê reviyan



û ketin taxên dora girtîgehê. Lê belê QSD û Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi lez girtîgeh kontrol kir û kesên xwe di wan taxan de veşartîbûn, tune kir. DAIŞ`ê dixwest bi wê planê Hesekê kontrol bike û bigihêje kampa Holê ku bi hezaran malbatên DAIŞ`ê tê de ne. Dûre biçe Reqayê ku berê navenda wan a sereke bû. Lê bi rastî bi saya destwerdana lezgîn a QSD`ê û dorpêçkirina cihê şer, ew plan negihişt serî.

Îro, navendên girtina çeteyên DAIŞ`ê, ji bo DAIŞ`ê zemîneke guncew e nemaze ku hîna çarenûsa vê dosyayê ne diyar e û gelek dewlet jî naxwazin hemwelatiyên xwe yên di nava DAIŞ`ê de vegerînin.

Xetereya Kampa Holê ji ya wan girtîgehan ne kêmtir e em dikarin wek "bombeyeke demkî" bi nav bikin. Ji ber ku li seranserî cîhanê kampa herî xetere ye. Ji ber ku hevjînên çeteyên DAIŞ`ê yên bi wê hişmendiyê ve girêdayî ne, nifşekî nû ku ji berê tûndtir û tundrawtir mezin dikin.

Sala 2023`yan li Sûriyê ya herî xwîndar bû. Ji ber ku tevgera çeteyên DAIŞ`ê zêde bû ku tirs û tevlîhevî belav kir. Çeteyan 336 êriş pêk anîn. Jê 165 li herêmên Bakru û Rojhilatê Sûriyeyê ne. Yên din jî li herêmên din ên Sûriyê kirine. Di encamê de 700 kes hatin kuştin di nav de sivîl û hêzên leşkerî jî hene. Li gorî Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê (SOHR) ew bûyer, bi çekên cur be cur hatine kirin, çi bi rêya dabenceyên bêdeng an jî kêr an jî mayîn û bombe.

Ji destpêka 2024`an ve, çeteyên DAIŞ`ê bi dehan êriş li çolistana Sûriyê ya di bin kontrola hêzên hikumeta Şamê de pêk anîne. Dema di navbera 15`ê Sibatê heta 16`ê Adarê de, di encama şer, êrişên çeteyên DAIŞ`ê de 80 kes hatin kuştin di nav de jin, zarok û leşker jî hene.

Her wiha Hêzên Ewlekariya Hundirîn di Sibata borî de di operasyoneke ewlehiyê ya berfireh de ku li Hesekê û heta navçeya Şedadê li dar xistiye, 13 çeteyên DAIŞ`ê girtin ku plan dikir êrişan li dar bixin ji bo ku ewlehiya herêmê têk bibin.

# Greva birçîbûnê ya girtiyên azadiyê berdewam e

**Girtiyên azadiyê bi daxwaza azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka Kurd 119 roj di greva birçîbûnê de ne.**

Girtiyên siyasî yên li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan, çareserkirina pirsgirêka Kurd bi rêyên demokratîk û rakirina tecrîdê, dest bi greva birçîbûnê ya demkî û dorveger kiribûn. Çalakî, di roja 119'an de berdewam dike. Çalakiya greva birçîbûnê di 27'ê Mijdarê di çarçoveya kampanyaya "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji bo pirsgirêka kurd çareseriya demokratîk" hate destpêkirin. Girtiyên siyasî destnîşan kiribûn ku heke heta 15'ê Sibatê tecrîd neyê rakirin dê çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû bikin.

Girtiyên siyasî bi navê Denîz Kaya di 12'ê Sibatê de daxuyaniyeke din da û wiha gotin: "Ji bo rakirina tecrîda li ser Rêbertiya me, me di 27'ê Mijdara 2023'yan de dest bi greva birçîbûnê kiribû û me ragihandibû ku dê di 15'ê Sibatê de derbasî qonaxeke din bikin. Lê belê ji bo bandorê li pêngava li derve hatiye destpêkirin û li xebatên hilbijartinê neke, me biryar da ku piştî hilbijartinê derbasî qonaxeke din bikin. Em çalakiya xwe ya greva birçîbûnê ya dorveger heta piştî hilbijartinê dirêj dikin."



# 'Çareseriya kirîzên Rojhilata Navîn Neteweya Demokratîk e'

Li Rojhilata Navîn ji bo berjewndiyên hêzên desthilatdar her ku diçe kirîz, şer û alozî kurtir dibin. Endamê PYD`ê Abdulkerîm Abdurihman diyar kir ku kilîta çareseriya tevahiya kirîzên Rojhilata Navîn, çareserkirina doza gelê kurd û filestînê ye.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Cîhan kirîzeke mezin jiyan dike ji encama pergala stemkar ya ku modernîteya kapîtalist li pêş dixist. Pîşesazî, netewdewlet û malgirtina kapîtalîst bûne mîna kabûsekî ku bihna tevahî mirovahiyê çikandine û îro roj tevahî cîhan xistiye bin bandora xwe, di heman demê de civakan parçe dike. Herwiha yek ji herêmên ku kirîzeke mezin jiyan dike, Rojhilata Navîn e. Rojhilata Navîn di şerekî cîhanê yê sêyemîn re derbas dibe, bi rengekî taybet. Lê ev şer taybetiyên wê yên cûdayî rahendên leşkerî û siyasî yên kilasîk e. Pergalên ku pergala kapîtalîst li ser Rojhilata Navîn ferz kirin da ku pirsgirêkên wê çareser bike, ew bi xwe bûne çavkaniyên pirsgirêkan li şûna çareserkirina wan.

**Çareserî doza kurd û Filestînê ye**

Rojhilata Navîn di nav şerên giran de di cîhan û herêmê de hatiye parvekirin û nexşeya wê hatiye guhertin, ji şerên di nava imperetoran de bigire û ta bighêje şerê cîhanê yê yekem ku di 1914 -1918 de gelek caran sînorê welatan hatine guhertin, herwiha hin dewlet avabûne û hin jî winda bûne, hin gel qir bûne û hin jî li ber xwe dane û ta roja îro ji bo bidestxistina mafên xwe têdikoşin, bi taybet piştî şerê cîhanê yê yekem û morkirina peymana Lozanê di sala 1923 ku du dozên aloz di Rojhilata Navîn de li pey xwe hiştiye, ew jî doza kurd û Felestîniyan ye ku heta roja îro jî her du doz û çareserkirina wan, kilîtên aramî û ewlehîya herêmê ne.



**Çareserkirina şerê Hemas û Israîl hevqebûlkirine**

Rojhilata Navîn di roja îro de dûbare şerekî pir alî têne meşandin, him herêmî ye û him jî navneteweyî ye. Lewra bi van şeran re guhertinên mezin çêdibin, di heman demê de şerê Hemas û Israîlê yê dawî jî wê guhertinan di Rojhilata Navîn de bi xwe re bîne û gelê ku herî zêde ji van pêşketinên Rojhilata Navîn bi bandor dibe, yek ji wan Kurd in. Ji xwe şerê ku îro di navbera Hemas û Isaîlê de heye, ne jî îro û duh ve ye, bi salên dirêj şer di navbera wan de dewam dike, lê şer tu encamên çareseriyê bi xwe re ne aniye, ji ber encam û çareserkirin ew e ku hevqebûlkirin di navbera gelê Hemas û Irasîl de bê kirin.

**Hewildana helwişandina dîwarên bêdengîya navneteweyî**

Ji xwe doza kurd jî heya niha nehatiye çareserkirin, tevî ku gelek serhildanên Kurd derketin holê lê bi destên xiyanetê tê diçûn. Piştî derketina Tevgera Azadiyê ya ku bi pêşengtiya Rêber Abdullah Ocalan ve tê birêvebirin, êdî kurd bi doz û mafê xwe hişyar bûn. Rêber Abdullah Ocalan hizir û ramanên wî ne tenê çareserî ji gelê Kurd re ye, çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn tevahiy e. Lê astengîya herî mezin li ber doza kurd û çareserkirina wê dewleta Tirk a dagirker e, dewleta Tirk pirojeya Xweserîya Demokratîk, weke şaneya despêkirina ji hevketina peymana Lozanê û avabûna Kurdistaneke azad dinerxîne. Lê bi despêkirina buhara Erebî re, hişmendîya nijadperest û dewleta Tirk a dagirker xwe daye pêş û bi hevpeymana di navbera AKP û MHP de, xewna pêkanîna Osmanîya nûjen xwe dabû pêş. Her wiha sepandina nearamîyeke domdar di Rojava de bi rêya êrîşên hewayî û topbaranê ku rê li ber koçberîyê û derhatina kirîzan veke û heta dawî piştgirîya çeteyên DAIŞ`ê re bike da ku Xweserîya Demokratîk lawaz bike û vala derxîne, hingê jî êrîşên dema dawî li ser binesazî, kargeh, navendên elektirîkê û sivîlan ku derfetên sîyasî û navneteweyî guncav bin, beşeke ji berdewamîya têkbirina Xweserîya Demokratîk û pêkanîna mîsaqa milî bû, lewra kurd jî heta dawî li ber xwe didin û bi hemû hêza xwe hewildana helwişandina dîwarên bêdengîya navneteweyî, biryarên Lozanê û serserîya dewleta Tirk dikin.

Derbarê şer û kirîzên ku li Rojhilata Navîn tên qewmandin, endamê Komîteya Rêxistinî ya PYD`ê Abdulkerîm Abdurihman ji rojnameya me re axivî. Abdulkerîm diyar kir ku ji ber zengînbûna erdnîgariya Rojhilata Navîn, şerkî cîhanî li ser tê meşandin û wiha got: "Rojhilata Navîn bingehê jiyana mirovahiyê ye ku cara yekem mirov li ser xaka wê jiyan kirin e. Di heman demê de bi hemû aliyên xwe dewlemende mîna avahewa, petrol, av, çandinî û hwd… jî. Lewra cîhan ji bo Rojhilata Navîn di nava şer de ne, bi taybet dewletên ku her tim li bercewendiyên xwe digerin. Bi taybet niha di Rojhilata Navîn de şer û pevçûnên diwqewimin pirsgirêkên Rojhilata Navîn zêdetir dikin."

**'Şer ne çareseriy e'**

Ebdulrihman di berdewamiya axaftina xwe de eşkere kir ku pergala netewdewlet bingeha hemû aloziyên li Rojhilata Navîn e û wiha got: "Pirsgirêka di navbera Hemas û Israîl de 75 sal in didome, encama pergala netewe-dewletê ye ku li Rojhilata Navîn bingeha hemû aloziyan e. Şerê ku di sala 1948`an bi damezirandina dewleta Îsraîlê re dest pê kir, di 7'ê Cotmeha 2023'an de bi êrîşa Hamasê re careke din gur bû û li gel wê bû sedema trajediyên mezin. Lewra şer û pevçûnên di navabera Hemas û Israîl bi şer çareser nabe, dive di navbera wan de çareseriyeke mirovî bê dîtin. Siyastên şer nagihên serî, gerek Hemas bi Israîl re bighên çareseriya di dewletan da ku ev şer bi dawî bibe."

**'Riya çareseriyê Neteweya Demokratîk e'**

Endamê Komîteya Rêxistinî ya PYD`ê Abdulkerîm Abdulrihman axaftina xwe wiha qedand: "Neçareserkirina pirsgirêka kurd heya niha, sedema xiyaneta PDK`ê ya dîrokî û hevkariya wê di roja îro de bi dewleta Tirk a dagirker re. Lê di pêvajoyek wiha de ku li herêmê her ku diçe alozî û şer girantir dibe, çareserî Neteweya-Demokratîk e, Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn ku paradigmaya Rêberê Gelan Abdullah Ocalan pêşxistiye, dikarê ji pirsgirekên heyî re bibe rêya bingehîn ya çareseriyê."



## Mizgînî û encamên wê!

**Ahmet Aktaş**

Di dîroka gelê Kurdistanê de Newroz ê, li dijî zaliman mohra xwe li ruhê serîhildanê û serkeftinê xistiye. Ev ruhê serîhildanê û berxwedanê, ji hezar salan heta roja îro hatiye, lê ji bo tefandina rohniya agirê vê destana hêja ya dîrokî êrîşên qirker ên desthilat û talankeran bê navber dewam kir.
Hema mirov dikare bêje hatibû qonaxa tarîkirina vê rohnahiyê, Rêber Apo di Newroza 1973 ya de li Bendava Çubuka Enqereyê ev agirê li ber vemirandinê bû, ji nûve pêxist. Bi çalakiya Kawayê Hemdemî Mazlum Doxan re ya li zîndana Amedê di Newroza 1982 ya de, ew agirê mîna ji xweliya xwe ve hatibû afirandin derbasî qonaxa duduyan bû. Bi pêşengiya Mahsum Korkmaz a pêngava 15' ê Tebaxa 1984 an de, derbasî qonaxa sisê ya bû û heta îro bi hemû lehengiya xwe dewam dike. Bi dilgirtina Rêberê Tevgêra Azadiyê ya dibe 26 salan û bi şehadeta ewqas pêşengan, her wiha bi êrîşên her cûre çekên klasik û modern ên kîmyewî jî li gel, ev agir venemirî, " xeyala ku xistibûn bin axa çiyayê agirî" ji nûve şitilî û qonax bi qonax pêşdiket.
Gava mirov van bûyerên 52 salan ên ji "Bendava Çubuk a Enqereyê" heta îro, hemûyan di zik hev de li ber çavan re derbas dike, êdî pêşîgirtin li vê tevgêrê û vî gelê berxwedêr nabe, êdî ev Rêbertî, Tevgêr û gel ewqas bi hev hatine girêdan û bûne xwedî îradeyek ji pola, kes nikare wan ji hev biqetîne û vê şoreşê bide rawestandin!
Ev jî ne bes bû, di êvara Newroza îsal a 2024 an de, mizgîniya xêrê jî bi ser ve hat û Cejna îsal a NEWROZÊ pirtir xemiland û tacidar kir.
Ev mizgîniya giring û watedar, ji aliyê Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel(NPG) ve hat û dibêje; "Gerilayên Azadiya Kurdistanê, bûne xwedî sîstema fuzeyên ku dikarin sîhayan bêbandor bikin; ji 13ê Sibata 2023an vir ve me 15 SIHA xistin xwarê…"!
Bi vê mizginiyê re, êdî şoreşa gelê Kurdistanê derbasî qonaxek nu dibe. Hema di serî de, bandora propagandeya wê tirsa ku bi rêya van " makîneyên mirinê" dikirin hat şikandin.
Her wiha dewleta tirk, wê bazirganiya li ser van SIHA ya dikir êdî weke berê nikare bike.
Vê mizginiyê, careke din gotinên Rêber APO piştrast kir ku "teknîka herî mezin mirovin" Bi gotinek din, heke mirov û tevgêr mejî baş bixebitînin, dikarin ji dewletan bêhtir afirandinê bikin û serkeftinan bi dest bixin!
Bêgûman ev mizgîni ji bo hemû gel û baweriyên jêrdest e, jiber ku ev dewleta faşîst, ne tenê Kurd, jibo hemû azadixwaz û demokratan xetere.
Bi vê mizgîniyê re, ew propagandayên dewleta tirk ku digotin, "PKKê çeka datinin û hwd." jî pûç bû.
Bi vê mizgîniyê re, gelê Kurdistanê û dostên xwe herikîn pîrozbahiyên Cejna Newrozê, bi coş û cesaret zêdetir bû.
Kurt kurmancî, encamên vê mizgîniyê, berevajî siyaset û planên dewleta faşist û hevalbendên wê, piralî û gelemperî bi coş hate pêşawazî kirin û wê baştir jî bibe.

# Dawî li lîstok û komployên Osmaniyan nayê

**Volqan Elî**

Di Çardê Adara 2024'an de li Baxdeya civîneke girîng hebû. Wezîrê dewleta Tirk serkeşiya vê civînê dikir. jixwe tenê bi serkêşiya wî jî be mirov dikare texmîn bike ku naveroka wê çi ye. wekî tê zanîn Hakan Fidan serokê berê yê MİT'a Tirk bû. ev jî taybetmendiyeke din a Şerê Sêyemîn ê Cîhanê ye. niha piraniya dewletên hegemon yan jî dixwazin xwe bikin hêzên serwer ên herêmê, grûba xwe ya rêveber yan jî hikumeta xwe ji van çêdikin. Vaye ev jî yek ji van e. heta serokwezîrê ji Îraqê yê ji beriya vê Kazimî û hwd.
Ne tenê li Rojhalata Navîn, li cîhana Rojava jî vê carê taybetmendiyeke cuda dikeve dewreyê. Serokwezîrê berê yê Îngîlîzîstanê, heta Trumpê bi nav û deng ku ji ber taciz, tecawiz û teşwîqa îsyanê, sabotajê hate darizandin, demekê serokê DYE bû û niha jî berendam e. yanî di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de hêzên desthilatdar, yan navêndên îstixbatatê yan jî kesên lewçe, tecawizkar, dest dirêjî kirine jixwe re dikin serok.
Li Rojhilata Navîn ji ber ku desthilatdarîtimî ber bi faşîzmê dibeze, Hakkan Fidan, Kazimî (serokwezîrê berê yê Îraqê) û kesayetiyên wisa li ser civakê dibin Nemrûdên hemdem. Taybetmendiyên rêxistinên îstixbaratê tê zanîn, bi taybetî rêxistinên îstixbarî yên dewletan wisa ye. Gelek taybetmendiyên wan hene lê hin ji wan sereke ne; komplo, rehîn girtin, santaj, sabotaj, ji bo berjewendiya dewletê her têkiliya qirêj li gel hêzên cuda. Vaye niha her çendî ew ne serokwezîrê dewleta dagirker ê Tirk e jî, ev dewleta dagirker bi vê hişmendiyê bi rêve diçe. Ji ber ku di heman rêveberiyê de ye. -
Civîna ku di vê dîrokê de li gel Baxdayê hatiye li darxistin jî bi bi vê hişmendiyê hatiye li darxistin.
Em vê yekê li ku dizanin? Ji encamê biryarên vê civinê…
Bi qasî ku hatiye aşkere kirin du encamên girîng ên civînê hene: rêveberiya Îraqê dê Tevgera Azadiyê wekî rêxistineke qedexe îlan bike û yan din jî dagirkeriya Tirkiyeyê dê para ava Dîcle ku heqê gelê Îraqê ye berde. Dîsa ew ê rêya petrolê ya Kerkuk-Ceyhan veke, serbest bike. Hê gelek tiştên din jî hene lê hemû hûrgulî ne. Têne ji vê derê jî fêm dibe ku li ser gele Îraqê, heta li ser dewleta Îraqê santajek, rehîn girtinek heye. Dagirkeriya Tirk li aliyekî av û gelek tiştên din ku ji mafên xwezayî yên mirovan in, yên gelê Ereb û gelê Kurd in rehîn digire. Dibêje "eger tu li dijî Tevgera Azadiyê şer nekî, qedexe îlan nekî ez ê ji ser te avê qut bikim. Ez petrolê te bi rêyên fermî nekirim, bi rêya çeteyên mala Barzanî bikirim. Vaye rehîn girtin û santaja li ser dewleta Îraqê ev e.
Ji aliyê din ve em li amelên Tevgera Azadiyê yên li Îraqê binêrin. Çi zerer û feydaya Tevgera Azadiyê li dewleta Îraqê heye? Hedefê bingehîn ê dewleta Tirk yek jî ew e ku xwe bigihîne sînorên Milî Mîsaqa xwe ya netewe. Ev sînor çi ne? Yanî petrolên Misûl û Kerkukê. Jixwe dema ku dagirkerî xwe bigihîne van hedefan di destê Îraqê de ne Misul û ne jî Kerkûk û ne jî petrolên wê dimînin.
Niha dewleta faşîst a dagirkeriya Tirk, ji bo ku xwe bigihîne van hedefên xwe (dibe ku Tevgera Azadiye bike bahane) li ser erdên Îraqê bi sedan baregehên leşkerî û bi dehezaran leşker bi cih kiriye. Tenê hêza ku li dijî wê şer dike, Tevgera Azadiyê ye. ev Tevger li welatê Îraqê qedexe kirin tê maneya ku ev der (bakurê Îraqê-Başur) ne erda Îraqê ye. dewleta Îraqê ev plana ji bo wê xeter, qebûl kiriye. Bi fermiyeta xwe, bi ser girtî be jî, qebûl kiriye. Eger Tevger Azadiyê sûcek kiribe ew e ku erdên Îraqê parastiye. Dibe ku Tevgera Azadiyê ji bo parastina xwe û Kurdistanê ev kiribe lê di heman demê de ji bo gelê Ereb û gelên cîran jî hêzeke parastinê ye. di vê oxirê de bi hezaran şehîd daye û ji dayinê jî xwe nade aliyekî.
Gotineke gelê Tirk bi xwe heye, dibêje 'Dawî li lîstok û komloyên Osmanî nayê'. Mînak; dagirkeriya Tirk jixwe di NATO'yê de ye. Sibê-du sibe ji Îraqê re bêje "yan tê bikevî NATO yan jî ez ê ava Dîcleyê li ser te qut bikim". Dewleta Îraqê dê çi bersivê bide? Tê zanîn dewleta faşîst a Tirk Misilmaniya Sunî diparêze. Halê hazir Îraq jî Şîa ye. Eger Tayip di seredana xwe ya meha Nîsanê de, ji serok Mihemed Şîa Sûdanî re bêje "yan tê wekî min bibî Sunî yan jî ez ê avê li ser te qut bikim." Îraq dikare çi bersiva heqîqî bide? Bersivê em nizanin. Bersiv li cem Îraqê ye.



# Çeteyên DAIŞ'ê; avabûn, şikestina li ser destê QSD'ê û xeteriya domdar

DAIŞ'ê di 13'ê Nîsana 2013'an de bi destekdayîna dwleta Tirk a dagirker hate avakirin, li Sûriyê û Îraqê komkujî û kiryarên herî qirêj li ser gelên herêmê pêk anî. Di 23'ê Adara 2019'an de QSD'ê wekû kawayên serdemê zincîrên koletiya ku DAIŞ'ê dest û lingên gel bend kiribû, şikand û li Baxozê berdewamiya destaneya serkeftinê ya ku ji Kobanê destpêkiribû bi dawî kir. Tevî têkçûnê jî lê hîna xeteriya DAIŞ'ê li ser ewlehiya herêm û cîhanê didome.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di 13'ê Nîsana sala 2013'an de Ebû Bekir Elbexdadî çeteyên DAIŞ'ê weke rêxistineke xwedî fikrekî herî xerab damezirand û têkiliyek dîrokî ya xurt di navbera van çeteyan û çeteyên Elqaida, Cebhet Elnusra de heye. Bi dirêjahiya salekê van çeteyan karîbû xew rêxistin bikin, ji derdora 81 dewletên cîhanê xwedî nasnameyên cuda xwe komî ser hev bikin û xwestin serweriya xwe li ser Îraq û Sûriyê pêk bînin. Piştî DAIŞ'ê di 10'ê Pûşbira 2014'an de Mûsil dagir kir û bi şûn de di 15'ê Pûşbira 2014'an de jî Telafer dagir kir. DAIŞ'ê piştî dagirkirina van herdu bajaran, vê carê jî berê xwe dane Şengalê û di 3'yê Tebaxa 2014'an de gelê Êzidî di komkujiyê re derbas kir. Hikûmeta Iraqê û Pêşmergeyên PDK'ê di dema êrîşê de, dest ji Şengalê berdan û jê vekişiyan. Di saetên berbanga sibehê de çeteyên DAIŞ'ê ber bi bajêr ve pêşde çûn, çekdarên PDK'ê ku hejmara wan bi qasî 18 hezar bûn, ber bi parêzgeha Dihokê ve reviyan, yên ku nedikarîbû bireve jî xwe spartin Yekîneyên Parastina Gel li Rojava.Gelê Şengalê û bi sedan malbatên koçber ên Mûsil û Tilefer û navçeyên ku li Şengalê diman bê çare man, tenê çiyayên Şengalê wekî rêya xilasiya ji mirinê dîtin û di bin germahiya havînê de û bi meşa li ser lingan xwe spartin çiya.Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û HPG û YJA star ji bo xilaskirina êzidiyên li çiyayê Şengalê korîdoreke mirovî vekirin. Bi sed hezaran kes ji komkujiyan rizgar kirin. Hêjayî gotinê ye ku di 13'ê Mijdara 2015'an de bi qehremanî û berxwedaneke mezin, bi pêşengiya Gerîlayên Azad, YBŞ , YPG, YPJ' û HPG û YJA star Şengal ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar bû. Piştî wê gelê Şengalê xwe bi rêxistin kir û pergala xwe ya Xweseriya Demokratîk av kir.

**Berxwedana Kobanê ya efsûnî**

Berxwedana Kobanê yek ji şerê herî dijwar yê ku YPJ û YPG'ê bi qehremanî li dijî çeteyên DAIŞ'ê birin lûtkeya serkeftinê. DAIŞê di 15'ê Îlona sala 2014'an de ji sê aliyan ve dest bi êrişa ser Kobanê kir, armanca wan ew bû ku di nava çend rojan de Kobanê bi temamî bixe bin serweriya xwe. Di 16'ê Îlonê de li gundên Taalak, Cubb El Ferec, Dokerman û Boraz ên rojavayê Kobanê di navbera çeteyên DAIŞ'ê û şervanên YPG'ê de şerên dijwar qewimîn. Li aliyê rojhilat jî li gundê Serzûrî, Cerin, Koberlek, Berkatak, Saronc û Qezelî şer û pevçûn çêbûn. Çeteyên DAIŞ'ê di êrîşê de tank û çekên herî giran bikar anîn û tevî hejmareke zêde ya çeteyan û bi piştgîriya nêzî 40 tankan, şervanên YPG û YPJ'ê dikarîbûn derbên giran li çeteyan bidin. Herwiha da ku çeteyên DAIŞ'ê bidin fêmkirin ku Kobanî ne mîna Mûsil, Şengal û Reqayê ye. Şer roj bi roj berfirehtir bû û hemû eniyên şer veguherîn kavilên şewitî. Piştî 134 rojan ji şerê di navbera şervanan û DAIŞ'ê de, efsaneya serkeftina Kobanê bi tîpên zêrîn tevî xwînê hat nivîsîn. Piştre jî hemleya rizgarkirina gundewarên Kobanê dest pê kir. Herwiha Minbic û Reqa, heta Baxozê. DAIŞ'ê nas kir ku têkçûna wan li Baxozê, ji şerê Kobanî dest pê kir.

**Têkbirina DAIŞ'ê**

Di dawiya sala 2015'an de çeteyên DAIŞ'ê 100 hezar kîlomitir ji rûbera Îraq û Sûriyê kiribû bin serweriya xwe. Herwiha di pêşveçûna kiryarên xwe yên qirêj li ser gelên herêmê û bi domdariya 2 salan, êdî qedera têkçûna DAIŞ'ê hat diyarkirin. Ji ber ku di destpêkê de Kobanê ji dest da û piştre jî Mûsil, Reqa Dêrazorê û têkçûna herî dawî li Baxozê bû.Şerê QSD'ê yê li dijî çeteyên DAIŞ'ê, ne kêmî şerê din yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. QSD'ê di çarçoveya pêngava ewlehiyê ya Şikandina DAIŞ'ê de, kampa Baxozê di 19'ê Adara 2019'an de ji destê çeteyan rizgar kir. Herwiha di 23'ê heman mehê de jî piştî 6 heftiyan hêzên QSD'ê karîn çeteyên herî xeternak li ser ewlehiya cîhanê têk bibin. Li gor malpêra fermî ya ragihandina QSD'ê di encama vê pêngavê de ji destpêka sala 2019'an heta 23'ê Adara 2019'an 1879 çete hatin kuştin. Di heman demê de 29 hezar û 600 kes ji çete û malbatên wan xwe radestî QSD'ê kirin û hejmara kesên sivîl yên ku ji kuştinê hatin xelas kirin 37 hezar kes bûn. Weke tê zanîn ku şervanên QSD'ê li ser ruyê erdê xwedî roleke sereke bûn di şikandina çeteyan de û ev yek jî bi piştgirtiya hêzên Hevpeymana Navdewletî ya asîmanî pêk hat. Piştî 7 mehan ji têkçûyîna DAIŞ'ê, dawî li hebûna serkêş û damezrînerê DAIŞ'ê; Ebû Bekir Elbexdadî jî hat. Kuştina Bexdadî di 27'ê Cotmiha sala 2019'an li bakurê Sûriyê, Idlibê bi êrişeke asîmanî ji aliyê hêzên Amerîkî û QSD'ê ve pêk hat.





**Li pişt têkbirinê dûmahiya xeteriya DAIŞ'ê li ser herêm û cîhanê**

Piştî têkbirina DAIŞ'ê li Baxozê û xweradestkirina zêdeyî 29 hezar ji çeteyan û malbatên wan, êdî xeteriya DAIŞ'ê li ser herêmê heya asteke baş kêmtir bû. Lê ev nayê wê wateyê ku bidawîbûna çeteyan bidawîbûna xeteriyê ye. Lê belê herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê girêdayî rewşa DAIŞ'ê û aramiya hundirîn, kete pêvajoyeke din de. Êdî bi hezaran kesên xwedî îdiyolojiya radîkal û hovane bûn weke mayîneke demkî nexasim li kampa Holê ku bû wargehek ji bo firkên terorîzmê. Kampa Holê ku 45402 kes ji malbatên DAIŞ'î têde hatine bi cih kirin, li kêleka kampa Roj a li Dêrikê ku 2605 kes ji malbatên DAIŞ'ê tê de hene, yek ji kampên herî metirsîdar yên cîhanê tê binavkirin e. Piştî ku QSD'ê di 23'ê Adara 2019'an li Baxozê yê girêdayî Dêrazorê dawî li hebûna DAIŞ'ê anî, raya giştî hewl dide çeteyên li kampa Holê ji bîr bike. Bûyerên li kampê diqewimin, bi taybetî jî piştî ku dewleta Tirk êrîşî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, DAIŞ ji nû ve zindî bû. Di heman demê de bi hezaran çeteyên DAIŞ'ê di girtîgihên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi cih bûn, ji van girtîgihan jî ya Sînaa li bajarê Hesekê ye. Heya niha dadgehên cîhanî û civaka navnetewî ji bo dadgeha van çeteyan xwe bêdeng dike. Herwiha piştî têkçûna DAIŞ'ê, dagirkeriya Tirk a ku piştgira serke bû ji bo DAIŞ'ê, êdî xwest dîse hebûna çeteyan zindî bike. Ji ber vê yekê jî dewleta Tirk a dagirker bû hevkara sereke bi DAIŞ'ê re di êrîşa girtîgeha Sînaa ya Hesekê û di encamê de 121 şervanên QSD'ê şehîd ketin. Di heman çarçoveyê de, heya roja îro jî dewleta Tirk ji bona hevkarî, destek û zindîkirina çeteyan tev digere û hertim dixwaze herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û cîhanê bigiştî bê ewle bihêle.

FENER



## Cehşokan xwîna Ehmedê Xalid Mamo badilhewa kirin

**Idrîs Henan**

Efrîna dagirkirî yek ji herêmên herî zêde rastî sûc û kiryarên faşîzma Tirk û çeteyên wê hatiye. Di dirêjahiya şeş salên mêtingeriyê de, dijminê kurdan; kêliyek be jî, ji bo guhertina demografîk wenda nekiriye. Bi gotinek din; ji saetên pêşîn ên dagirkirina Efrînê, kurt û kurmancî dijatiya xwe ji bajar, akinciyên wê yên resen, lawir û sewalên wê, xweza û hawîrdora wê re ragihandiye. Lew re; bê ku dem wenda bike, bê westîn ji bo guherîna demografîk û qirkirina çandî bi şev û roj xebitiye. Li ser bingeha siyasetek qirker a bi vê zihniyeta paşverû ya xwe spartiye navendên yekdestarî û netewperestiyê, sûcên kuştin, destavêtin, talankirin, desteserkirin, revandin, avakirina şûngehên mêtingeriyê, texrîbata xwezayê, guherîna demografîk, dizîna şûnwarên dîrokî û çandî yên gel û baweriyan, di asteke bilind û bilez de, li bajar û gundewarên Efrînê dane meşandin. Ji bona tekûzkirin û bilezkirina wan sûcan, hinek cehşokan mayînan dan pêşiya xwe û çanda resen ya gelên Efrînê xiste hedefa xwe ya yekem. Ji ber wê armancê, derhal li ser reşkirin, talankirina dîrok û vînê dest werdaye ayînên neteweyî û olî yên gelên herêmê.
Bê guman hemû tiştên li jor hatine gotin, nûnertiya rasteqîn a qetek ji kiryarên dagirkeriya faşîzma Tirk li Efrînê nakin. Lê weke sernav; têrê dike ku mirov nijadperestiya li ser erdê bi sernavê Neweroza 2023`an bi bîr bîne. Wê çaxê; êrişên qirêj ên qirkirina çandî ku bi destê ezbeniyên çete û bi serpereştî û destûrnameya cehşîtiya Kurd, şeva berî Newrozê, bi qetilkirina sê endamên malbata Pêşmerg li navçeya Cindirêsê tacîdar bûn. Sûcê wan şehîdan ew bû ku agirê Newrozê li ber mala xwe di tenekeyekê de dadabûn. Li gel dagirkerekî wisa be, helwesteke neteweyî çiqas bi çûk be jî, têrê dike te bikuje û tune bike!
Îroj piştî ku hindek raportên navneteweyî yên weke (NY, Human Rights Watch( û gelek rêxistinên sivîl ku kiryarên faşîzma Tirk li Efrînê weke sûcên şer û sûcên guherîna demografîk dihesibînin, hewl didin van kiryarên xwe kamûfilaj bikin. Lew re, tavilê piştî sûcê qetilkirina ciwanê bi nave Ehmed Xalid Mamo li navçeya Cindirêsê, ku ew jî beriya Newroza îsal bi hefteyekê qewimî bû, destûrnameya şahiyên Newrozê yên bi awayê kerneval dan. Odeyên istixbarata Tirk û rêveberên paşperdeya şerê taybet, ev erk dan hinek cehşokên Kurdan (Kurdên Spî) ji bona ku xwîna Ehmedê ciwan badilhewa biçe û çi raeksyoneke cemawerî ya muhtemel hebe, ji nav bibin.
Dewleta faşîst a Tirk, piştî sûcê qetilkirina Ehmed Xalid Mamo, hîs kir ku kelek û nefretek gelêrî gihaye asta teqînê nava gelê Efrînê de li dijî dagirkeriyê û çeteyên wê pijiyaye. Bi Newrozê re ew kelecan, gengaz bû, bi şiklê neteweyî bi berxwedana duyem qonaxa Serdemê re bibûya yek par û li dijî zilma şeş salan a faşîzmê biteqiya? Ji ber vê têgihaştina mêtingeriyê dest werda rewşa rûdaye û derhal cehşokên xwe xistin dewrê ku qaşo alîgirê vîna gelan e! Mixabin bi destê cehşokan (Kurdên Spî) hestên Efrîniyan ên neteweyî jî hatin desteserkirin û xwîna Ehmed Xalid Mamo bîlasebeb hate wendakirin û aliyê hiqûqî ve jî, hewldaneke valaderxistina raportên navneteweyî bû ku sûcên dagirkeriyê werin tepisandin.
Lê divê were zanîn ku cehşokan 20 Çileya 2018`an rênîşanî dagirkeriya Tirk û çeteyên wê dikirin, heman hevsûcên qetilkirina ciwanê Kurd Ehmed Xalid Mamo. Pêwîste berî dagirkeriyê, hesabê wê yek ji wan û her kesê ku kiryarên faşîzmê li Efrînê rewa dike were pirsîn. Faşîzma li Amedê bi dehan mirovên Kurd, roja Newrozê, binçav bike, li Şîladizê Kurdan bombebaran bike, ne ji bo sûcekî hê mezintir be, ti carî destûra lidarxistina cejneke neteweyî nade. Faşîzm li her derê faşîzm e.